şopdara rastiyê ye

Ronahî

Hejmar :408 nameronahi@gmail.com 8- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Çuyîna zozanan bi qasî çuyîna welatekî xerîb zehmet buye

***Zozanên bakurê Kurdistanê xwedî bedewî û taybetiyeke cuda ne. Lê dewleta Tirk bi salane di bin navê operasyonên leşkerî û ewlekariyê de zozanan li Kurdan qedexe dike. Yek ji zozanên ku nehatiye qedexekirin Berçelan yê li Colemêrgê ye. Lê dîsa jî welatî dibêjin ji ber balafirên keşfê û operasyonan çuyîna zozanê gelek zehmet buye.***









Li Colemêrgê yek ji zozanên ku neqedexekirî Berçelan e, lê belê dîsa jî bêyî destûr kes nikare biçe zozanê Berçelanê. Kesên diçin zozanê tim bi balafirên keşfê yên bi çek ango SÎHA'yan tên şopandin. Gundiyan got: "Dema em diçin zozana xwe, wekî ku em ji welatekî biçin welatekî din."

Li Colemêrg û navçeyên wê bi hinceta "ewlehiyê" gelek herêm hatine qedexekirin. Her wiha hin herêmên ku nehatine qedexekirin jî gundî bêyî destûr nikarin biçin hin zozanan. Yek ji van zozanên ku neqedexekirî ne jî Zozanê Berçelanê û Zozanê Zoma Hecî Şefîq e.

**WEKÎ KU EM BIÇIN WELATEKÎ DIN**

Naîf Kanat çûyîna zozanan şiband çûyîna bi pasaport û diyar kir ku dema ew diçin zozanan bi SÎHA'yan tên şopandin. Kanat got: "5-6 meh e em diçin zozanan. Hewa vira xweş e, lê belê şert û mercên wê yên din zehmet in. Lê belê wekî ku em diçin welatekî din, dema belge di dest me de tune be em nikarin biçin. Li noqteyên sînor tenê pasaport têr dike, lê li vira rewş cuda ye. Divê hem nasname hebe hem jî belgeya taybet a destûrê. Dema ev tune bin em nikarin biçin zozanan."

**ŞIVAN ÊVARÊ NIKARIN AGIR VÊXIN**

Kanat, destnîşan kir ku dema belgeya destûrê li cem wan tune be nikarin biçin û got: "Divê hûn vê daxwaznameyê li walîltiyê dagirin, li emniyetê bê mohrkirin û dema hûn bên divê li ser we be. An jê hûn nikarin biçin. Her sal ev zozan şahî bûn. Berçelan bêhan Colemêrgê ye. Lê mixabin ev du sal in 4 kes nikarin di vê rêyê de derbas bibin. Hûn li tevahiya herêmê nikarin deh mirovan bibînin. Hema bêje herêm ji mirovan hat xalîkirin. Êvarî em nikarin ji qada zozanê derkevin. Li vira jiyana girtîgeheke nîvvekirî heye. Li ser serê me tim amûrên hewayê digerin."

Hayrettîn Karataş ku şivantiyê dike got: "Li van deran dema mirov şivan be xweş e. Deştên mezin hene, giya zêde ye û av hênik e. Dema serokomar hatibû Colemêrgê gotibû ew dawî li qedexekirina zozanan bînin. Ev ne rast e. Bêyî belge mirov nikare were van deran. Dema mirov tê vir wekî ku diçe Îran an jî Sûriyeyê. Bêyî pasaport me bernadin."

Şivan Tayîp Şahîn jî got: "Berê şivantî rihet bû. Lê niha biroj eger belgeya destûrê tune be, em êvarî ji tirsan nikarin biçinc ihekî. Dev ji zozanan berdin, navenda bajêr ji ber Rewşa Awarte veguheriya herêma tampon. Ji bo em rihet bikin em ji herêma Berwarê hatin, lê rihetî tune ye. Em tim diqilqil in. Bi navê aramiyê tiştek tune ye. Rayedarên hikûmetê timd ibêjin em ê sewalvaniyê destek bikin. Lê mixabint iştekî wisa tune ye. Her diçe sewalvanî kêm dibe."

**ZOZAN XWEŞ IN, LÊ ARAMÎ TUNE YE**

Bêrîvan Bînnaz Kanat jî, anî ziman ku li zozanan tahbê dibînin lê belê tu rihetî û aramît une ye, çimkî endîşeyên wan hene. Kumrî Alpsar jî, anî ziman ku gelek gundî hatine girtin û her diçe jiyana wan zehmetir dibe û got: "Em ji gundê Şumûnîsê yê Berwarê hatin vira. Em bis ewalvaniyê debara xwe dikin. Em bi tiştên ku li vira bi dest dixin debara xwe dikin û zarokên xwe didin xwendin. Lê mixabin Serkomar Erdogan destûra me nade. Zozan hemû qedexe ne. Li zozanên ne qedexekirî jî em nikarin bi rihetî tev bigerin. Li her derî jiyan zehmet kirine."

Bîlal Alpsar jî anî ziman ku ji ber qedexeyan êdî bazirgan jî nayên û got: "Berê van çaxan li van deran şahiyên qusandinê çêdibûn. Bazirgan ji Sêrt, Êlih û Şirnexê dihatin û hirî dikirîn. Bi pereyên van hiriyan ciwan dihatin zewicandin, mal dihatin raxistin. Lê mixabin niha ji ber qedexeyan ne bazirgan tên ne jî şahî tên kirin. Ji ber vê niha dema em pezên xwe diqusînin em hiriyê dixin kîsan û wekî ku çop be datînin qeraxên rêyan. Ev jî dibe sedema kêmbûna dahatê. Lê mixabin hikûmet vî tiştî ji bo me rewa dibîne."...*MA*

## Şaredariya El-Ksrat xebatên xwe didomîne



Şaredariya Gel a girêdayî Meclisa Sivîl a Dêrazorê ya herêma El-Kesrat tevî kêmderfetên xwe hewl dide xizmeta gel bike.


Ji destpêka ku Şaredariya Gel a El-Kesrat di 1`ê Gulana 2017`an de dest bi kar û xebatên xwe kir, hewl dide li gorî derfetên xwe xizmeta gel bike.

Di destpêkê de şaredariyê komîteyên şopandinê û rêxistinê ava kirin. Şaredarî ji komîteya zabiteyan a şopandina tevgera sûkan û buhayê madeyên xwarinê, beşa paqijyê û her wiha gelek beşên din ên xizmetê pêk tê.

Şaredariyê Çerxerêya El-Kesrat se-rerast kir. Rê û dikanên bazirganiyê boyax kirin da ku rengê herêmê xweşik bibe. Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê herêm xistibû bin zilma xwe rêyên sereke û gelek cih xirab kiribûn.

Şaredariyê xendekên ku çeteyên DAIŞ`ê kolandibûn, girtin. Ji aliyekî din ve jî hemleya reşandina dermanên mêş û maran dest pê kir û dest bi jinûve aktîfkirina bîra El-Kesrat ji bo avdana parkan kir.

Hevserokê navçeya El-Kesrat Xeyas El-Ecîl derbarê projeyên wan ên pêşerojê de diyar kir ku ew dixwazin şitilgeh, stad û sûkeke pez vekin, her wiha hewl didin daran ji nû ve li parkan biçînin. El-Ecîl di axaftina xwe de bang li rêxistinan kir ku karê xwe li hemberî xizmeta civakê baş pêk bînin...*ANHA*



## Kampa Serdem tê firehkirin

Şaredariya Gel a Şehbayê bi hevkariya Rêveberiya Xweser a Kantona Efrînê karê xwe yê firehkirina Kampa Serdem berdewam dike.

Di çarçoveya xebatên firehkirina Kampa Serdem de, Şaredariya Gel a Şehbayê 300 konên din li kampê bi cih kirin da ku malbat tê de vehewin.

Di vê derbarê de endamê rêveberiya Kampa Serdem Idrîs Weqas da zanîn ku ev pêngava ku pê rabûne, erênî ye û wê di kampê de bazarekê jî vekin.

Weqas da zanîn ku wê derdora 43 firoşgehên cilan di kampê de werin vekirin ji bo ku pêwîstiyên koçberan bi giştî pêk werin...*ANHA*



şopdara rastiyê ye

Ronahî

nameronahi@gmail.com Hejmar : 408 8 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Çete li ser parvekirinê hevdu dikujin



Piştî ku leşkerên Tirk yên dagirker û çeteyan Efrîn dagirkirin dest bi talan, kuştin, revandin û wêrankirinê kirin. Niha jî çeteyên dagirker li ser parvekirina mal û milkên gel li hev nakin û hev du dikujin. Komên çete yên bi navê Feyleq El Şam û Ehrar El Şam li ser parvekirina pezên gel yên ku dizîne bi hev ketin.*R-2*

# BILA NÊÇÎRVAN JI KURDAN LÊBORÎNÊ BIXWAZE

PDK dîsa ji bo xwe ji rewşa tengav rizgar bike û desthilatdariya xwe biparêze, herî girîng jî xwe bi dewleta Tirk a dagirker bide qebûlkirin dîsa êrîşî PKK'ê dike. Di nava Kurdan de nerazîbûnên li dijî daxuyaniyên qirêj yên Nêçîrvan Barzanî her diçe zêde dibe.



### PKK NEBÛYA WÊ BAŞÛR JI DEST ÇÛBUYA

Siyasetmedarê Kurd Dr. Fayiq Gulpî li ser daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî a li dijî PKK'ê ku gotubû, 'PKK beşeke xaka Herêma Kurdistanê dagirkiriye' got, "PKK nebuya wê başûr ji dest çûbûya. Ti fêdeyeke daxuyaniyên wiha yên Barzanî tune. Ev tenê dijminên gelê Kurd kêfxweş dike. Ev daxuyaniyên Barzanî dilê gelê Kurd êşand. Ji ber vê divê Barzanî lêborînê ji gelê Kurd û PKK'ê bixwaze."

### PKK HÊZEKE KURDISTANÎ YE

Parlamenterê Tevgera Goran Şêrko Heme Emîn daxuyaniya serokwezîrê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî rexne kir û got, "PKK hêzeke Kurdistanî ye û axa başûrê Kurdistanê parast. Daxuyaniya Barzanî rasterast xizmeta dagirkeriya dewleta tirk dike: "Wê ev daxuyanî bandoreke neyînî li yekitiya kurdan a her çar parçeyên Kurdistanê bike."

### DIVÊ KURD YEKÎTIYA XWE AVA BIKIN

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê PDK-S'ê Dr. Abdulkerîm Siko derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî başûrê Kurdistanê de axivî û diyar kir ku divê Hikumeta Iraqê li hember êrîşên li ser axa Iraqê helwestê nîşan bide û biryar bigire. Her wiha Siko da zanîn ku divê gelê kurd li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk bibe yek. *R-4*

## Teqîna li Minbicê nîşaneya têkçûna wan e

Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê têkildarî êrîşa li dijî meşa ku li navçeya El-Heya ya Minbicê pêk hat daxuyaniyek da û destnîşan kir ku êrîş têkçûna êrîşkaran nîşan dide. MSD'ê wiha got, "Ev êrîşên ku sivîlan hedef digirin, têkçûna çeteyan û aliyên piştgiriya siyasî û leşkerî dide wan nîşan didin." *R-5*

## HDP wê têkoşîna xwe mezintir bike



Hevserokên Rêxistinên HDP'ê yên bajaran piştî hilbijartinên 24'ê Hezîranê yekem car civiyan. Civîn bi beşdariya Hevserokên Giştî Pervîn Bûldan û Sezaî Temellî pêk hat. Temellî di civînê de axivî û got, "Gel xwedî li HDP'ê derketin û diyar kirin ku bê HDP nabe. Erdogan ji niha û pê ve wê hîn bêhtir zordariyê bike, HDP jî wê li dijî zordariyê têkoşîna xwe mezin bike." *R-4*

## Hejmara birîndaran derket 32'yan



Hejmara sivîlên ku di teqîna navçeya El-Heya ya Minbicê birîndar bûne derket 32 kesî. Komîteya tendurustiyê diyar kir ku ji bilî birîndarekî rewşa hemû birîndaran baş e. Cîgira Hevserokatiya Komîteya Tenduristiyê Muna Zekeriya diyar kir ku rewşa 22 birîndaran sivik bûn piştî hatin dermankirin ji nexweşxaneyê hatin derxistin û yên din jî rewşa wan baş e, niha tên dermankirin. *R-2*

## Li Deraa'yê şer hat rawestandin



Ev bi rojane bombebarana li ser Deraayê giran bûbû û bû sedem ku bi sed hezaran sivîl ji cih û warên xwe derkevin. Li gorî Navenda Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê, ji ber hevdîtinên nû di navbera rêjîma Sûriyê û nûnerên Deraayê de dest pê kir lewra jî bomberan hat rawestandin. *R-2*

## Rapora Efrînê hat eşkere kirin




Komîteya Dîplomasî, Têkiliyên Karê Derve ya Şehba û Rêveberiya Kantona Efrînê, têkildarî pirsgirêkên gel ên li Şehba û Şêrewa raporek amade kir. Di raporê de hate destnîşankirin ku ji ber bêderfetiyên tenduristiyê û mercên giran di nava gelên li gundan û kampên li herêma Şehbayê bicihbûne de nexweşiyên cihê rû didin. *R-5*



## Efrîniyan encamên konferansê nirxandin

Piştî ku konferansa rizgarkirina Efrînê li Şehbayê hat lidarxistin ji aliyê endamên konferansê de encamên konferansê bi civînên berfireh ji gel re hat parvekirin. Welatiyên Efrînê ku tevlî van civînan bûn diyar kirin ku heta dawiyê ji bo rizgarkirina Efrînê ew ê li pişt şervanên xwe bin. *R-6*

## Ji bo zarokên xwe daxwaza edaletê dikin



Malbatên 34 kesên ku di encama bombebarana balafirên şer ên artêşa Tirk de li gundê Roboskî yê girêdayî navçeya Şirnex a Qilabanê hatin qetilkirin, di hefteya 340'î de li ser gora zarokên xwe hatin ba hev. Malbatan ji bo zarokên xwe daxwaza edaletê kirin. *R-2*

## 30 herêm hatin qedexekirin



Êrîş û kiryarên dewleta Tirk li dijî gelê Kurd li bakurê Kurdistanê dewam dikin. Bi qedexeyan hewl didin gel bê zar bikin. Walîtiya Colemêrgê ragihand ku li tevahiya bajar 30 herêm weke 'Herêmên ewlekariya taybet' hatiye îlankirin, ji çûn û hatinê re hatiye qedexekirin. *R-2*

# Çete li ser parvekirinê hevdu dikujin

***Piştî ku leşkerên Tirk yên dagirker û çeteyan Efrîn dagirkirin dest bi talan, kuştin, revandin û wêrankirinê kirin. Niha jî çeteyên dagirker li ser parvekirina mal û milkên gel li hev nakin û hev du dikujin. Komên çete yên bi navê Feyleq El Şam û Ehrar El Şam li ser parvekirina pezên gel yên ku dizîne bi hev ketin.***



Li herêma Cindirêsê ya ji aliyê çete û artêşa Tirk ve hatiye dagirkirin, çeteyên Feyleq El-Şam û Ehrar El-Şam li ser parkirina sewalên dizîne, bi hev ketin. Tê gotin ku kuştî û birîndarên herdu aliyan hene.
Li gorî agahiyên ku çavkaniyan dane, li navenda herêma Cindirêsê ya ji aliyê artêşa Tirk û çeteyên wê ve hatiye dagirkirin çeteyên Feyleq El-Şam û Ehrar El-Şam li ser parkirina sewalên dizîne şer kirin û dengê ambulansê ji cihên şer hatin bihîstin.
Çavakaniyan diyar kirin ku şer derdora saetekê berdewam kir… *ANHA*



## Hejmara birîndaran derket 32'yan

Hejmara sivîlên ku di teqîna navçeya El-Heya ya Minbicê birîndar bûne derket 32 kesî. Komîteya tendurustiyê diyar kir ku ji bilî birîndarekî rewşa hemû birîndaran baş e.
Li gorî Komîteya Tenduristyê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarên wê, hejmara sivîlên ku di teqîna navçeya El-Heye ya Minbicê birîndar bûne derket 32 kesî.
Komîteyê diyar kir ku rewşa Elî El-Hisên yê 55 salî birîndar bûn ew rakirin nexweşxaneyên Heleb.
Cîgira Hevserokatiya Komîteya Tenduristiyê Muna Zekeriya diyar kir ku rewşa 22 birîndaran sivik bûn piştî hatin dermankirin ji nexweşxaneyê hatin derxistin û yên din jî rewşa wan baş e, niha têne tedawîkirin…*ANHA*

## Li Deraa'yê şer hat rawestandin



Dema ku lihevkirinên nû di navbera Rûsya û komên çekdar de dest pê kir, êrîş û topbrana li ser herêmên Deraayê hatin rawestandin.
Li gorî Navenda Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê, di dema ku lihevkirinên nû di navbera Rûsya û nûnerên parêzgeha Deraayê de dest pê kir da ku çarenûsa parêzgehê û başûrê Sûriyê diyar bikin, topbaran jî hate sekinandin.
Navendê diyar kir ku di dema ku hêzên rêjîmê û çekdarên ku destekê didin wê li ser sînorê Sûriye-Urdinê pêşde diçin, topbaran hate sekinandin. Bi vê yekê hêzên rêjîmê ber bi korîdora li ser sînorê Urdinê ve pêşde diçin û di navbera wan de tenê 3 km mane.
Girêdayî mijarê çavkaniyan ji korîdora li ser sînorê Urdinê û Sûriyê re diyar kir ku wan panzêr û alavên leşkerî ku ala Rûsyayê rakiribûn ku ber bi korîdorê ve diçûn, dîtin. Çavkaniyan her wiha got ku wan karwanek li ser rêya leşkerî ku ber bi korîdora di bin dagirkeriya komên çekdar de diçû, dît.
Ji destpêka ku hêzên rêjîmê di 19`ê Hezîranê de operasyonên leşkerî li başûrê Sûriyeyê dest pê kirine û bi vir ve, di encama topbarana li ser herêmê 159 sivîlan, di nav de zarok û 33 jinan jî hene, jiyana xwe ji dest daye.

## Hevşaredara Lîcê hat berdan



Hevşaredara Lîcê Rêzan Zugurlî ku bi hinceta cezayê wê yê girtîgehê heye bi zaroka xwe re hat girtin, di doza 25 sal cezayê girtîgehê jêre dihat xwestin de, hat berdan.
Hevşaredara navçeya Lîcê ya Amedê Rêzan Zugurlî ya qeyûm tayînê cihê wê hat kirin, bi hinceta beşdarî şermezar kirina binçavkirina Hevşaredarên Bajarê Mêzin a di 25'ê Cotmeya 2016'an de bû, doz hatibû vekirin. 2'yemîn danişîna doza Zugurlî li Dadgeha Ceza Giran a 10.emîn a Amedê hat dîtin. Zugurlî bi hinceta cezayê 4 sal û 2 meh girtîgehê yê dozek din, bi zaroka xwe ya 2 salî re kiribûn Girtîgeha Tîpa T a Wanê. Danişîna ku Zugurlî beşdar nebûn de, parêzerên wê beşdar bûn.
Parêzera Zugurlî Habîbe Danişman Beyar parastin kir û got: "Muwekîla min ji bo hempîşeyên xwe hatiye li ber paredariyê û girtina wan şermezar kiriye. Ev tiştek asayî ye. Tu sûcekê vê yekê tuneye û beraeta muwekîla xwe dixwazim." Piştî parastinê, Şandeya Dadgehê bi hinceta sûcên li ser Zugurlî ne sabîtin, biryara beraetê da.
Di îdîanameya derbarê Zugurlî hatibû amede kirin de, bi îdîaya "Endamtiya rêxistinê", "Propagandeya rêxistinê kirin", "Pesnê sûc û sûcdar dayîn" û "Beşdarî meş û xwepêşandanên ne fermî bûyîn" ji 9 salan heya 25 salan cezayê girtîgehê dihat xwestin.

## Li Nîkaragûayê zêdeyî 300 kes mirin

Li Nîkaragûayê, xwepêşandanên li dijî hikumetê ev çend meh in dewam dikin. Di xwepêşandanan de ku polîs û çalakger bi hev dikevin, gelek xwepêşandêr mirin.
Li Nîkaragûayê ku welatekî li Amerîka Navîn e, xwepêşandanên li dijî Serokdewletê sosyalîst Danîel Ortega û hikumetê dewam dikin. Hate ragihandin ku di xwepêşandanên du roj berî de herî kêm 3 çalakger hatine kuştin.
Li gorî daxuyaniya Komeleya Mafên Mirovan a Nîkaragûayê (ANPDH), ji ber serdegirtina polîsan a li bakurê rojava yê welêt çend kes mirine. Li Sûtîabayê ku gelên xwecihî lê ne, di dema çalakiya birîna rê de ciwanekî jiyana xwe ji dest da. Li nêzî bajarê Lêonê jî 2 xwepêşandêrên ciwan mirn.
ANPDH û Dêra Katolîk ragihandin, ku ciwanên xwepêşandêr di dema destwerdana polîsan de mirine. Tê gotin ku hin xwepêşandêr jî piştî ku ji polîsan reviyan li malên ku xwe lê girtibûn hatine kuştin.
Di bûyeran de zêdeyî 20 xwepêşandêr birîndar bûn, bi dehan ji wan jî hatin destgîrkirin.



Danîel Ortega piştî Şoreşa Sandînîst, di navbera salên 1979-1990'î de Nîkaragûa bi rê ve bir. Sala 2007'an ij nû ve hate hilbijartin û ji ber reformên ku dixwaze li qada civakî bike, bûye hedefa mûxalefetê. Ortega beriya niha bi çend mehan xwest projeya 'reformê' ku mûçeyên teqawîtan kêm dike, bixe meriyetê û li dijî wî xwepêşandanan dest pê kiribûn.
Bi xwepêşandanan re ku 18'ê Nîsanê dest pê kirin, dest ji projeya reforman hate berdan. Lê şer neqediya. Li gorî çavkaniyên cuda heta niha 220 heta 309 xwepêşandêr mirine, nêzî 2 hezar kes jî birîndar bûne.
Mûxalefeta rastgir û Dêra Katolîk dixwazin hilbijartinên serokdewletê yên sala 2021'ê di sala 2019'an de bên kirin.

## Çalakgeran Nêçîrvan şermezar kirin

Çalakgerên Mertalên Zindî bi daxuyaniyekê, daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî ya ku PKK weke dagirker bi nav dike, şermezar kirin.
Li Binarê Qendîlê çalakiya Mertalên Zindî ya Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê ya li dijî dagirkeriyê di roja 27'emîn de didome. Çalakgeran bi daxuyaniyekê bersiv dan daxuyaniya Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî.
Ji çalakgaran Ehmed Germiyanî daxuyanî da û got; "Em ê li hemberî xeta xiyanetê rawestin."
Germiyanî wiha dewam kir "Li ser Başûrê Kurdistanê hewldanên dagirkeriyê heye. Li hemberî vê dagirkeriyê hikûmeta Iraqê bêdenge, ev jî te wateya erê kirinê.
A rast ev bêdengî şermezekî mezine. Bêdengiya li hemberî dagirkeriyê, tê wateya çavê xwe li dagirkeriyê girtin. Em daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî şermezar dikin. Barzanî bi awayekî eşkere bang li dagirkeran dike ku bikeve Başûrê Kurdistanê de. Em xiyanetkarên bi faşîzmê re jî şermezar dikin. Em weke çalakgerên mertalên zindî dibêjin ku, ji bo me ti cudahî di navbera Erdogan û Nêçîrvanî Barzanî de nîne."

## Ji bo zarokan daxwaza edaletê dikin



Malbatên Roboskiyan, di hefteya 340'î de jî daxwaza edaletê kirin.
Malbatên ku wêneyên zarokên xwe yên kuştî û winda rakirin gotin: "Ji bo hemû zarokên dibin qûrban daxwaza edaletê dikin.
Malbatên 34 kesên ku di encama bombebaran balafirên şer ên artêşa Tirk a dagiker de li gundê Roboskî yê girêdayî navçeya Şirnex a Qilabanê hatin qetilkirin, di hefteya 340'î de li ser gora zarokên xwe hatin ba hev. Li ser navê malbatan Berîvan Encû axivî.
Encû got: "Rojên borî 25'emîn salvegera Qetlîama Madimakê bû. Êşên me mezin in. Dibe ku dîrok, roj, ziman û nîjadên van êşan cuda be. Lê mîna Roboskiyê Madimak jî êşa me ya hevpar e."
Encû got: "Divê îxlalkirina mafê jiyanê yên zarokên li Roboskî, Gezî, Cizîr, Silopiya ji nedîtî ve neyê. Em her hefteyê mîna zarokên xwe yên hatine bomberdûmankirin, ji bo hemû zarokên bi îhmal û destdirêjiyê dibin qûrban daxwaza edaletê dikin."

## 30 herêm hatin qedexekirin

Êrîş û kiryarên dewleta Tirk li dijî gelê Kurd li bakurê Kurdistanê dewam dikin.
Walîtiya Colemêrgê ragihand ku li tevahiya bajar 30 herêm weke 'Herêmên ewlekariya taybet' hatiye îlankirin, ji çûn û hatinê re hatiye qedexekirin.
Walîtiya Colemêrgê, li tevahiya bajar 30 herêm ji bo 15 rojan bi hinceta ewlehiyê qedexe kir.
30 herêmên dikevin di navbera sînorên navçeya Gever, Şemzînan û Çelê de ji 8-22'yê Hezîranê 'Herêmên ewlehiya taybet' hatin îlankirin.







# Divê jin çanda xwe ya resen biparêze

***Parastin û pêşxistina çandê erkek sereke ya jinan e. Jin li hember polîtîkayên asîmîlasyonê û çanda populîst hê zêdetir dikarin civakê biparêzin. Berdevka Kongreya Star a Til Temir Çinar Yûsif bal kişand li ser bandora fîlmên Tirkî û Hîndî yên li ser civakê û da zanîn ku ev dibe sedem Kurd di bin badora wan de bimîne.***



Berdevka Kongreya Star Çinar Yûsif bandora filmên Tirkî û Hindî yên li ser jin û civakê nirxand û got: "Filîmên Tirkî û Hindî dibe sedem ku gelê Kurd di bin bandora çanda popîlist de bimîne û jinê ji xwezaya xwe, çanda xwe ya kevnar dûr dixe."
Bandora çanda popîlîst her ku diçe zêde dibe û ev dibe sedem ku mirov ji çanda xwe ya xwerû dûr bikeve. Gelê Kurd jî bi salan e ku di bin zext û êrîşan de ye û her dem ji xwezaya xwe hatiye dûrxistin.
Di vê mijarê de medya rolek girîng dilîze. Her wiha filîmên bi Tirkî û Hindî hinek jê bandorek neyînî bi taybet li ser jinê dike û dibe sedem ku jin ji çand û xwezaya xwe dûr bikevin. Têkildarî vê mijarê Berdevka Kongreya Star Çinar Yûsif anî ziman ku divê jin ji çanda xwe ya kevnar dûr nekevinû got:" Divê jin her dem xwe ji çanda popîlîst biparêze. Lewra jin bingeha civakê ye."
Çinar Yûsif da zanîn ku desthilatdar her dem bi zimanê medyayê şerên psîkolojîk li ser civakê dide meşandin û bi vê yekê polîtîkayên xwe yên asîmîlasyonê jî dixin meriyetê û wiha got: "Medya bandorek neyînî li ser jin û ciwanan dike û bi vê yekê teslîmî kapîtalîzmê dibin. Her wiha nakokiyên di nav civakê de jî kûrtir dike. Loma divê di serî de jin û hemû kes xwe ji lîstikên medyaya desthilatdaran biparêze."
Çinarê wiha dewam kir: "Ji ber şêwaza ne rast û şerê derûnî yên ku li ser medyayê bi rêya filim û reklaman tê dayin ev yek jî bandorek neyînî li ser ehlaq, jiyan û çanda civakê dike. Medyaya ku tenê ji bo berjewendiya kapîtalizmê û desthilatdaran dixebite jinê bi awayekî ne rast bi civakê dide naskirin. Loma divê haya mirov ji vê lîstikê hebe û tedbîra xwe bigire."
Çinarê herî dawî wiha got: "Ji bo civak bi tevahî ber bi xetereyê ve neçin divê zarok û ciwan bên perwerdekirin û li filmên ku jinê diçewisînin û rêya ne rast nîşanî mirov didin, neyê temaşekirin. Divê mirov xwedî li çand û hunera xwe derkeve û ji çanda popîlîst dûr bikeve. Ev jî dê bi hêz û vîna jinê pêk were."

## Belgefilma 'Rûniştin Baş Nîne'




Belgefilmeke bi navê 'Rûniştin Baş Nîne' li ser şervanên enternasyonalîst yên Rojava hatiye çêkirin, di têde li bersiva pirsa, çima du eniyên zehf ji hev dûr heta li dijî hev karîne di heman eniyeke li dijî DAIŞ'ê de cih bigirin, tê gerîn.
Belgefilma 'Rûniştin Baş Nîne' ya ji aliyê derhêner Zanyar Omranî ve li ser jiyana du aliyên çepgir û rastgir yên şervanên biyanî di nava YPG'ê û şoreşa Rojava de hatiye çêkirin. Di vir de behsa nakokî û bihevketinên du îdeolojiyên dijber ku weke rastngir û çepgir tê zanîn de dike ku herdu jî di şoreşa Rojava de cih digirin.
Derhêner di nava vê belgefilmê de leşkereke kevin yê Amerîkî û komeke şervanên çepgir yên Alman û Tirk hilbijartiye. Ev herdu alî di warê îdeolojîk de bi temamî ji hev cewazin û mil dane milê şervanên Kurd û Ereb ji bo serketina Şoreşa Rojava (Bakurê Sûriyê) şer dikin.
Jorden Matson Yek ji wan şervanên enternasyonalîste ku her ji destpêkê ve di medya civakî de kariye şoreşa rojava bi raya giştî ya cîhanê bide nasîn û gelek şervanên biyanî berê xwe bidin şoreşa Rojava.
Di belgefilmê de tê dîtin ku komek ji şervanên çepgir yên Tirk û Elman ne tenê ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê li Rojavayê Kurdistanê ne. Sedemeke din a tevlîbûna wan a ji şoreşa rojava re ewe ku eniyeke çep li seranserê cîhan pêş bixin.
Axîn û Ernesto jî du şervanên çepgirin ku derhêner wan di dirêjiya belgefilmê de dest girtiye.
Pirsa sereke ya belgefilma 'Rûniştin Baş Nîne' ewe ku ev şervanane çima çûne Rojava. Vê pirsê ji van şervanan dike û ew bixwe bersiva xwe didin.
Belgefilm 50 deqîqeye û di du demên cûda (2015-2017) de hatiye kişandin. Di film de her şervanek bi zimanê xwe yê dayîkî axiviye.

## Keleha Şêrewane a dîrokî

Keleha Şêrewane yek jî cihên dîrokî yên herêma Germiyan û Kurdistanê ye. Ji berî 152 salan ji aliyê Heme Paşayê Caf ve hatiye çêkirin. Niha ji ber kevin bûnê û erdhejê metirsiya rûxîna hinek beşên wê heye.
Keleha Şêrwane dikeve başûrê navçeya Kelar a Germiyan û di nava 8 salan de hatiye avakirin. Ji dema hatiye avakirin ve sê caran hatiye nûjenkirin.

**DÎROKA AVABÛNA KELÊ**

Li gorî dîroknasan Kela Şêrewane di navbera salên 1866 û 1874'an de ji aliyê Heme Paşayê Caf ve li ser Girê Şiwêndewar ê Şêrwane yê li navçeya Kelar a ser bi îdareya Germiyan hatiye çêkirin. Kela Şêrewane di nava 8 salan de hatiye çêkirin.
Kelhê dikeve başûr rojhilatê navçeya Kelar. Kelhe ji sê qatan sereke pêk hatiye. Qada yekem û duyem ji sê odeyên mezin, ode, merdîven, taq, agirdank û dûkelkêşê pêk tê. Herwiha qada sêyemîn ê kelhê jî bi weke beşê çandê hatiye bi nav kirin. Kelhe niha ji ber erdheja par nihek rûxaye. Beşek wê jî derz lê bûne. Şiwênewariya Germiyan bi nûjenkirina cihên ziyan dîtive mijole.
Deriyê sereke yê Kelha Şêrwane tenê dergiyekî du aliye ku aliyê serê bi tevahî vekiriye. 4 birçên kelhê hene. Cihê ku kelhe li ser hatiye çêkirin, nêzî 400 merte çargoşe ye. Di aliyê pêşiyê de 19 metre û 35 santîn metreye. Di aliyê piştê de 5 metre û 18 santînmetreye. Dirêjiya aliyê rastê 15 metre û 40 santînmetreye. Di aliyê çepê de jî 15 metre û 20 santînmetreye. Bilindiya kelhê di aliyê pêş de heya daqa duyemîn 7 metre û 95 santînmetreye. Di aliyê pişt ve jî 7 metreye.
Madeyên ku di çêkirina kelhê de hatine bikaranîn ji kelpîçên ji axê hatine çêkirin, kisil û geçê pêk tê. Bi awayekî ciwan û qayîm hatiy çêkirin. Herwiha di çêkirina wê de dar hatine bikaranin. Darê gozê ji bo çêkirina derî û pençereyan hatiye bikaranîn. Madeyên di çêkirina kelhê de hatine çêkirin weke yên gundên Şêrewan e. Herwiha ji Rûbarê Sîrwan av ji bo kelhê anîne.
Kela Şêrewane ji dema hatiye çêkirin ve sê caran hatiey nûjenkirin. Di sala 1925, 1988 û 1998'an de hatiye nûjenkirin. Ji ber erdheja par niha jî bo nûjenkirina cara 4'emîn kar destpê kiriye. Nûjenkirina wê ji aliyê rêxistinekî Holandî ve were çêkirin. Biryare di demekî nêzîk de nûjenkirina wê temam bibe.

**HEME PAŞAYÊ CAF KÎ YE?**

Navê wî Paşa Mihemed kûrê Keyxusrew ê kurê Silêman Beg ê kurê Zahîr Begê kurê Yar Emed Begê Seyfula Begê Seyid Ehmed e. Di sala 1881'an de ji dayik bûye.
Serokê Eşîra Caf bû. Xwedî desthilatdariyekî berfireh bû. Ji Şarezûr heya Germiyan di bin desthilatdariya wî de bû.
Nivîskarê Pirtûka Kela Şêrwane Cîhad Deloy derbarê kelê de wiha got; "Li gorî gotina dîroknasan, Heme Pasayê Caf Kelha Şêrwane zêdetir ji bo du sedeman çêkiriye. Yekem , ji bo ku desthilatdariya wî li ser wê herêmê hebe û li jêr destê xwe de bigire. Dûyemîn, ji bo bêhnvekirina xwe û eşîra xwe. Niha jî kelha Şêrwane cîhekî dîrokî û girînge.Yek ji cihên girîng ên Iraqê û Herêma Kurdistanê ye ku xelk tên serdan dikin."… *ROJNEWS*





## Tifaq Yan Yekîtî

Sîpan ŞÎNDA

Di nivîsên berê de me rêçek ji peyvan re vekirîbû û me gotibû emê li ser vê rêçê peyvan bişopînin. Peyv, ji bo zimanî weke stêrkên li ezmananin. Di şevên havînê de hinga mirov zarok, li ser bana diraza û dema mirov diço di nav cihan de mirov ji fekirina wan stêrên li ezmanan têr nedibû. Bi çavên zîq me li wan stêrkan dinêrî. Yên vemirî, yên geş, yên geştir, yên kom... (Niha ji dest min bikeve ez bi qasî zarokan dixwazim vê bijîm). Dema yek ji wan stêrkan ji ber çavên min winda dibûn dilê min ji li ser hev de diçû û ez ji xwe re li stêrkek geştir digeriyam. Peyv jî ji bo zimanî welêye. Çawe dema li gor zarokan stêrkek dimire, ezman ji xalî dibe û ew tamê jê nabînin, ji bo ziman ji, dema peyvek winda dibe ziman ji qels dibe. Yan ji weke daristanekê, çawe hingî darek ji nav rêlê bê birrîn rêl zeîf dibe, ziman ji wisa ye. Divê him mirov dara ji daristanê nebire û guhdanê lê bike, him ji divê mirov lê zêde bike, biçîne. Divê mirov ji bo zimanî ji him peyvên heyî biparêze him ji yên nû li ser ve zêde bike da ku xurt û dewlemend bibe. Da ku dema peyvin winda bibin ji yên şûna wan bigirin hebin.
Her weha di nava zimanan de dan û stand her tim çêbûye û wê her tim çêbe ji. Di nava zimanê Kurdî de gelik peyvên erebî hene. Bi taybetî ji piştî Islamiyet ketî di nava Kurdan de ev peyv zêdetir bûne. Gelik ji van jî mirov nikare bi hêsanî ji nava zimanî de derbixe ji. Yek ji van peyvan ji peyva "tifaq" e. Wata wê: li hev kirin, li hev hatin, bi hevre livîn, di gotin û xeberê yêk de bûn e. Ev peyv ji zimanê Erebî tê. Bes demek dirêje ketiye di nava zimanê Kurdî de û ciyekî vê peyvê yê qayîm ji heye. Heta ciyekî wê yê ewqas qayîm heye, biwêj pê hatine çêkirin, mesele li ser hatine gotin . Mînak 'tifaq tifiqî'. Ya rast peyveka xweşik ya şûna 'tifaq'ê tê bikaranîn di Kurdî de heye. Peyveka gelik xurte ji. "Yekîtî". Ev peyveka resene û ji Kurdî tê. Ji peyvajimara 'yek' ê çêbûye. Yekîtî ji di wateya bi hevre livîn, li hev kirin, li hev hatin, gotin û xeberên hevdû kirinê de ye. Gelik caran di nivîsan de ev herdû peyv li cem hev tên danîn. Lê ya rast ev yeka henê guhê mirov dixwerine. Dema herdû peyv, ango 'tifaq' û 'yekîtî' bi hev re tên bikaranîn, diyare ku qelsiyek heye û divê yek ji wan bê avêtin. 'Yekîtî' bese! Peyva yekîtî di zimanî de pirr tê bikaranîn. Bi taybetî, ji ber ku Kurdan di cîhanê de hêj di vî qernî de ji nekarîne yekîtiya xwe çêkin, ev herdû peyv li ser devê gelik kesane. Lê mixabin hê ji tenê di devê wan de ye û ji bo yekitiyê jî tenê serdevin. Yekîtî, ji bo Kurdan ne tenê peyveke. Ew giyaneke. Weke nan û avê, weke hewayê ji bo jiyana Kurdan, ji bo serkevtina wan lazime. Hemî Kurd vê gotinê dibêjin. Ne tenê Kurd, herweha biyaniyên vê bê yekîtiya di nava Kurdan de dibihîsin, şaqis dibin û di serî de ji bo serkevtinê, 'yekîtiyê' pêşniyarî Kurdan dikin. Raste, heta em nebin yek, emê herin yek bi yek'!

# Efrîniyan encamên konferansê nirxandin

**Piştî ku konferansa rizgarkirina Efrînê li Şehbayê hat lidarxistin ji aliyê endamên konferansê de encamên konferansê bi civînên berfireh ji gel re hat parvekirin. Welatiyên Efrînê ku tevlî van civînan bûn diyar kirin ku heta dawiyê ji bo rizgarkirina Efrînê ew ê li pişt şervanên xwe bin.**

Idrîs HENAN

Gelê Efrînê li Şehbayê bi hêviyeke mezin tevlî civînên parvekirina encamên Konferansa Rizgarkirina Efrînê dibe. Şêniyên li kampa Berxwdan dimînin gotin ku ew li benda lidarxistina vê konferansê bûn. Şêniyên Efrînê diyar kirin ew ê heya dawiya li pey şervanên xwe bimeşin û di eniyên pêş ên serferberiya hatiye ragihandin de cihê xwe bigirin.

### BI TERZÊ BERÊ KAR NABE



Şêniyê bi navê Reşîd Îbrahîm ku nişteciyê kampa Berxwedan e got: "Her gelê me li pey rêvberiya xwe ye. Li gorî encamên konferansê rêvebir bê piştgiriya gel nikare bi tenê bimeşe û nabe rêvebir." Îbrahîm tekez dike ku ji vir û pêve pêwîste kesayetên guncaw li cihên guncaw bin. Bi terzê berê karkirin nameşe. Îbrahîm dawiyê de got ku heya ji wan bê ew ê cihê xwe di nava serferberiya hatiye ragihandin de bigirin û ji bo rizgarkirina Efrînê heya mirinê li pey şervanên xwe ne.


Kalemêrê heştê salî Osman Hisên ê ji gundê Ereba dibêje: "Ji bo rizgarkirina Efrînê gereke em bibin yek. Em li benda ti kesî nesekinin were ji me re Efrînê rizgar bike. Lidarxistina konferansê gaveke serkeftî di vî alî de ye."

### PÊWÎSTE EM QISÛRÊN XWE NAS BIKIN



Nîhad Mihemed Zêno yê ji gundê Şîtka dibêje: "Bi riya vê konferansê me kêmasiyên xwe yên berê nas kir. Pêwîste li kêleka rêveberiyê gelê me jî qisûra xwe nas bike û li ser bisekine. Ger em nasnekin, em ê têk biçin." Zêno di nav axaftinên xwe de bal kişand ser rêbazê rexne û rexnedayînê û got: "Weke destpêk gaveke di cih de ye, lê pêwîste ji kesên ku qisûr kirine





hesab bê xwestin. Ger bê xwestin jî bila bên guhertin. Ji bo rizgarkirina Efrînê em ê bi hemû hêza xwe li pişta şervanên xwe bin."

Mihemed Hesen ê ji gundê Gemrûkê derbarê encamên konferansê de ev tişt anî ziman: Her kes dizane em di encama komployeke navneteweyî de gihane van kampan. Ancax em bi rêxistin, yekîtî û civandina li dora hêza xwe bi hêz bin. Tişta girîng em kêmasiyên xwe yên berê dubare nekin. Lidarxistina vê konferansê jî gaveke xwe rêxistinê ye. Hesen balê dikişîne rojên qonaxa yekemîn ên Berxwedana Serdemê û dibêje: ji bo ku em neketina vî halî, pêwîst bû em ji gundên xwe derneketina. Lê dîsa jî hêviya me bi encamên konferansê mezin e ku vegera bi rûmet nêz e.

### EM Ê ERKÊN XWE PÊK BÎNIN

Hec Cemîlê heftê û heşt salî jî ku ji gundê Şîtka ye got: Tişta di konferansê de derketiya ew e ku pêwîste gel û rêveber hev û din temam bikin. Dijminê me her li dijî hebûna me êrîşên kirêt pêk aniye. Ger em xwedî li nirxên xwe yên madî û manewî derkevin, emê rê li ber hovîtiya dijmin bigirin. Ev yek



wê bi hêza xweser a gelan pêkan be. Ti carî em pala xwe nadin aliyên derve. Hec Cemîl dawiyê de tekez dike ku wê bi vê temenê xwe yê mezin cih di nava seferberiya hatiye ragihandin de bigire û ev tişt anî ziman: ji bo rizgarkirina Efrînê, ez, mal, milk, zarok û zêçên xwe amade ne erka dikeve ser milê me pêk bînin.

Hêjayî gotinê ku di navbera 18 û 21 Hezîrana derbasbûyî de li Kantona Şehbayî bi beşdarbûna zêdeyî 250 delegeyan Konferansa Rizgarkirina Efrînê li dar ker. Di encamê de ji bo rizgarkirina Efrînê li ser hemû astên siyasî, civakî, dîplomasî û leşkerî serferberî hat ragihandin.

Ji bo ravekirina encam û nîqaşên konferansê li Şehbayî civînên girseyî tên lidarxistin. Di wan civînan de nerîn, rexne û helwesta gel hatin parvekirin. Her wiha endamên rêveberiya xweser jî li pêşberî gel rexnedayîn didin.

# Welatiyên Qamişlo pirsgirêkên xwe nîqaş kirin

Meclisa Taxa  Xerbî ya bajarê Qamişlo ji bo guftugoyên li ser pirsgirêkên civakî civînek li dar xist.

Meclisa Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo bi armanca ku pirsgirêkên civakî guftûgo bikin, bi gel re civiyan.

Civîn li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêx bi tevlîbûna bi sedan endamên saziyên, Av, Elketrîk, Şaredariya Xerbî û Tirafîkê  hate lidarxistin.

Hevserokê Kantona Qamişlo Hesen Mihemed armanca lidarxistina civînê diyar kir û anî ziman ku ew ê hewl bidin di vê civînê de pirsgirêkên civakî ji welatiyan guhdar bikin, da ku bi hev re çareseriyê peyda bikin.

Hesen Mihemed, bal kişand ku di demên dawî de derbarê rakirina wêneyên şehîdan û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser riyan gelek îdîayên ne di cih de û ji rastiyê dûr, belav bûne û wiha got, "Hin îdîa belav bûne, dibêjin ku di navbera Rêveberiya Xweser û




rêjîma Sûriyê de îtîfaq çêbûne, ji wan wêneyên şehîdan û yên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan werin rakirin, îdîayên bi vê rengî ti rastiya wê tuneye, tu alaqeya xwe bi siyasetê ve nîne. Rakirina al, sembol û wêneyan karê şaredariyan e, armanc jê ew e ku wêneyên şehîdan li ber rojê û tozê neşewetin. Her kes dizane ku şehîdên me nirxên me ne, ji ber wê pêwîste li cihên guncaw werin danîn."

Hesen Mihemed, bang li welatiyan kir ku li pey îdîayên vala nekevin.

Şêniyên ji taxa Qenat Siwês a bajarê Qamişlo, pirsgirêka kêmbûna avê li taxê parve kirin û gotin ku kêmbûna avê bandoreke neyinî di gelek aliyan de çêdike û daxwaz ji meclisê kirin ku di zûtirîn demê de pirsgirêkê çareser bikin.

Meclisê, hemû pirsgirêkên gel nivîsandin û soz dan ku ew di demeke nêzîk de li ser pirsgirêkan bisekinin…*ANHA*

# Şêniyên taxa El-Miseher ji qutbûna avê bi gazinc in



Şêniyên taxa El-Miseher a rojhilatê Tebqayê ji mehekê ve ji ber qutbûna avê bi gazin in.

Heta niha aliyên têkildar pirsgirêka qutbûna avê li ser taxa El-Miseher çareser nekirine, şêniyên taxê jî diyar kirin ku ew neçar dimînin avê bikirrin.

Welatiyê taxê yê bi navê Etiye El-Mihêmîd li ser pirsgirêka qutbûna avê axivî û wiha got: "Ji ber qutbûna avê em azaran dikişînin, bi mehane ava negihiştiye hin malbatan, ji ber wî jî em mecbûr dimînin ku avê bi buhayê 50-100 lîra her bermîlekê bikirin."

Welatiyê bi navê Ayid El-Helûş Komîteya Avê ya Şaredariyê rexne kir û diyar kir ku ew erka xwe pêk naynin lewma welatiyên taxê bê av dimînin.

Berpirsên Komîteya Avê jî pirsgirêk bi xirabûna jeneratora avê ya sereke ya benda Firatê ve girê da û diyar kir ku zexta avê di boriyan avê de kêm e, lewma av nagihîje hemû malan.

Berpirsên komîteya avê da zanîn ku bêderfetiyên wan zêde ne û destnîşan kir ku heta niha alavên kolandinê ku yên herî girîng in, li gel wan tune ne.

Berpirsan her wiha anîn ziman ku pirsgirêk ne tenê dikeve ser milê wan, lê belê ji ber tunebûna koordîneyê bi rayedarên Bendava Firatê re, gelek ziyan ji ber ceyrana ne bi awayekî birêkûpêk digihîje wan, amûrên wan zirarê dibînin… *ANHA*

# Meclîsa Sivîl a Reqayê karên mezin bi serxist

Meclîsa Sivîl a Reqayê, piştî rizgarkirina Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê, gelek gavên mezin avêt û karên serkeftî pêk anî.

Meclîsa Sivîl a Reqayê ji Meclîsên herêmên din cudatir e. Meclîs di Reqaya ku bibû peytexta DAIŞ'ê piştî QSD'ê ew ji çeteyên DAIŞ'ê rizgarkirin, hat damezrandin. Bajar bi temamî hatibû wêrankirin lê ev tişt li ber Meclîsê nebûn asteng û Meclîs tevî astengiyan xebatên xwe ji bo jinûveavakirina bajar bê navber meşand.

Serkeftina Meclîsa Sivîl a Reqayê tê wateya serkeftina hemû pêkhateyên gelên Sûriyê. Hin dewletên dagirker serkeftina Meclîsê weke xeteriyekê li ser berjewendiyên xwe dibînin lewra êrîşan pêk tînin.

Çeteyên DAIŞ'ê bajar wêran û talan kiribûn. Hemû binsaziya bajêr ji ceyran, av, nexweşxane, dibistan û pirên bajêr û gundewarên wê bi rêjeya ji %85 wêran bûne. Çete beriya ku ji bajêr vekişin 8000 mayîn tê de çandibûn, ew jî xebata Meclîsa Sivîl a Reqayê asteng dike.


Meclîsê heta niha 7 nexweşxane, navendên tendrûstiyê, 232 dibistan li hemû herêman û 25 dibistan li navenda bajêr vekir. Her wiha komîteyên Meclîsê piraniya bajêr ji bermahiyên çeteyan paqijkiriye û hêjî xebatên xwe didomîne.

Meclîs 5 hezar koçber ku koçberî herêmên rizgarkirî bûne, pêşwazî kir û pêdiviyên wan yên pêwîst bi cih anî.

Hevseroka Meclîsa Sivîl a Reqayî Leyla Mistefa, bal kişand li ser desteka kêm ya navnetewî û diyarkir ku ev destek ne li gorî hewcedariyên herêmê ye.

Derbarê projeyên pêşerojê de Leyla got: "Gelek projeyên Meclîsê hene û MSD'ê desteka wê dike. Lê hin proje bi hewcedariya alîkariyên mezin heye lewra kengî ev alîkarî hat dayîn ew proje wê pêk werin"…*ANHA*







# Li ser çeperê destanên berxwedanê hene

***Ev demeke dewleta Tirk êrîşî başûrê Kurdistanê û bi taybet herêma Xakurkê dike û dixwaze dagir bike. Lê ev êrîşên dagirkeriyê rastî berxwedaneke mezin ya gêrîla tê. Gerîla Roza Bager ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li Xakurkê şer dike got, "Dijmin dibêje Xakurkê qediya ye. Lê belê niha li her çepera Xakurkê destana berxwedanê heye."***

Gerîla Roza Bager ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li Xakurkê şer dike got, "Dijmin dibêje Xakurkê qediya ye. Lê belê niha li her çepera Xakurkê destana berxwedanê heye."

Li navçeya Şemzînan a Colemêrgê, berxwedana gerîlayên HPG û YJA Starê ya li dijî êrîşên giran ên dewleta Tirk dewam dike.

Gerîlaya YJA Starê Roza Bager a ji Şemzînanê qala xeta berxwedanê ya ji Şemzînanê heta Xakurkê kir. Bager işaret bi girîngiya stratejîk a herêma Şemzînanê kir û got, "Li Şemzînanê ji dayik bûm, mezin bûm û tevlî nava refên gerîla bûm. Şemzînan ji bo min cihê gavên destpêkê ye. Di dîroka têkoşîna me ya 40 salî de jî Şemzînan xwedî cihekî girîng e. Dijmin jî bi taybetî Şemzînanê dike hedef, cerdevaniyê lê ferz dike û gelê li herêmê mecbûrî xwe dike. Şemzînan ji ber ku di navbera Başûr, Bakur û Rojhilat de herêmeke li ser xeta bazirganiyê ye, cihekî rengîn e."

Roza Bager işaret bi têkoşîna mezin a gel a li dijî faşîzma dewleta Tirk kir û got, "Dijmin nikare xwe li rengên me jî rabigire. Halbûkî kesk zindîbûna xwezayê, zer roj e ku dilê mirovan germ dike û sor jî hêrsa me ya li dijî dijmin e. Ev reng jî tên qedexekirin."

Bager li ser gerîlabûnê jî wiha axivî: "Ez tevlî nava refên gerîla bûm û hatim Xakurkê. Dema ku derketim cihê herî bilind ê Xakurkê min cara yekê azadî hîs kir. Îsal pratîka min a duyemîn e li Xakurkê. Niha li Xakurkê li dijî êrîşên dagirkeriyê berxwedaneke bêhempa heye. Tevî gerîlayên ku hebûna wan coş û kelecanê dixe



nava dilê min, şer dikim."

Gerîla Roza Bager diyar kir ku wê bibin şopdarên fermandar Agirî û wiha dewam kir: "Dijmin bi piştgiriya teknîkê kete herêmê. Leşker bi piştgiriya teknîkê dijî. Leşker nikare serê xwe ji kozika ku tê de ye rake. Me berxwedana xurt a Agiriyan, Berfînan dîtin. Li her çeperê destanên berxwedanê hene. Dijmin dibêje Xakurkê temam e. Lê niha li her devera Xakurkê heval di çeperan de şer dikin. Derbên giran li dijmin tên xistin."…*ANF*

# Jin Kurd di bin şertên giran de dixebitin

Li Amedê jina bi navê Yuksel Yildiz, bi ked û hunera xwe tenûran çêdike. Yuksel, da zanîn ku çêkirina tenûran gelek zehmet e û di şert û  mercên giran de dixebitin. Tenûr di jiyana kurdan de xwedî cihekî taybet e.  Lê belê eleqeya ji bo vê çandê her ku diçe kêm dibe.  Li gel pêşketina teknolojiyê jinên kurd hêj vê çandê didomînin. Li taxa Seyrantepe ya navçeya Yênîşehîra Amedê jin ji bo hem çanda xwe bidomînin û hem jî debara xwe bikin tenûran bi destê xwe çêdikin û dema ku difiroşin jî pê debara xwe dikin. Ji van jinan yek jê jî Yuksel Yildiz e.

### EZ BI TENÛRAN DEBARA XWE DIKIM

Dayika 7 zarokan Yuksel Yildiz bi axa taybet, bi keda destê xwe û bi hûnera destên xwe tenûran çêdike. Yuksel a ku ev 15 sal in tenûran çêdike wiha bahsa xwe dike: "Ez ji gundê Baylik ê navçeya  Lîcêya Amedê me. Di salên 190'î de gundê me ji aliyê dewletê ve hat şewitandin û em neçar man ku ji gundê xwe koçber bibin. Piştî ku gundê me hat wêrankirin û şûnde ev   27 sal e em li taxa



Seyrantepeyê dijîn. Gûndê me hatiye wêrankirin û dema mirov diçe gund mirov nema nas dike.  Xaniyê min bi kirê ye û ji bo ku ez debara xwe bikim min li vê taxê dest bi çêkirina tenûrê kir. 15 sal in ez tenûran çêdikim. Bi îv awayî hem manda xwe diparêzim û hem jî debara xwe dikim. Karê me di salên borî de gelek baş bû. Lê niha krîza aborî bandora xwe li ser kesên ku tenûran dikirin jî kiriye û tenûrên ku em çêdikin ji ber krîzê de destê me de dimînin û em nikarin bifiroşin. Min sala borî jî tenûr çêdikirin û difrotin, lê belê ne weke rewşa niha bû, tenûr dihatin  firotan. Ji xwe dema em difiroşin jî zêde kara wannîne lê dîsa jî çavkaniya min a debarê bûn."

Yuksel, da zanîn ku her sal di meha adarê de dest bi çêkirina tenûran dike û di dirêjiya axaftina xwe de wiha behsa çêkirina tenûran kir: "Ji bo ku em tenûran çêbikin di serî de em diçin axê dikirin ji ber ku axa taybet divê ji bo çêkirina tenûran. Li gel axê em kayê jî dikirin ji bo ku em tevli xerê tenûrê bikin. Ez ewilî kayê û axê tevlihev dikim û piştre avê lêdikim dikim herî . Ji bo ku tenûra çêdikim baş be ez piştre jî mûyê bizinan diavêjim nav. Wêkî ku hevîr bistrêm, heriya xwe distrêm. Piştî heriya min amade dibe vê carê dest bi çêkirina tenûrê dikim. Ez di hefteyekê de 4-5 tenûran çêdikim û bi hev re diqedînim. Em tenûran li ser rê difroşin, kesên ku bixwazin bikirin tên dikirin. Her tenûrek buhayê wê di navbera 70 û 100 TL yî de diguhere. Li gorî keda ku ez didim ez ewqasî qezencê nakim. Lê dîsa jî hewl didim pê debara xwe bikim. Em ji biharê de dest pê dikin û heta serê zivistanê tenûran çêdikin  û difiroşin.  Berê kiryarên tenûran ji Riha, Enqere, Edene û Mêrdînê dihatin. Lê niha ji ber krîza heyî kesek zêde tenûran nastîne."…*JIN-NEWS*

# Kongreya Star meclisa xwe hilbijart

Kongreya Star li bajarokê Rimêlan bi civînekê meclisa xwe ava kir. Meclis ji 7 endaman pêk tê.

Kongreya Star li bajarokê Rimêlanê li navenda meclisa navçeya Girkê Legê civînek li dar xist. Bi dehan endam û rêveberên Kongreya Star a bajarokê Rimêlanê yê girêdayî navçeya Girkê Legê beşdarî civînê bûn.


Di civînê de hevpeymana Kongreya Star ji aliyê yek ji rêveberên Komîteya Têkiliyên Dîplomasiyê ya Kongreya Star a herêma Cizîrê Sena Xelîl ve hate xwendin.

Paşê deriyê hilbijartinê hate vekirin û 7 jin ji bo Meclisa Kongreya Star a bajarokê Rimêlanê hatin hilbijartin.

Civîn bi dirûşmên "bijî berxwedana jinan" hate bidawîkirin…



# Biryar hate girtin ku Yuksekdag girtî bimîne



Rûniştina doza Hevseroka berê ya HDP'ê Fîgen Yuksekdag hate taloqkirin.

Rûniştina Hevseroka berê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Fîgen Yuksekdag ku rehîn tê girtin li Dadgeha Cezayê Giran a 16'an a Enqerê hate dîtin.

Yuksekdag ji ber sedema ku ji ber şertên girtîgehê heftiyê çend saetan dikare xwe bigihîne dosyayê û bi sedema ku mafê wê yê xweparastinê tê sînordarkirin tevlî rêniştinê nebû.

Parêzera Yuksekdag Rûken Gulagacî xwest ku Yuksekdag were berdan û parastina xwe bi rengekî bi tenduristî bike.

Şandeya Dadgehê bêyî ku parastina Yuksekdag bistîne biryar li ser da ku rewşa girtîbûna wê bidome û danişîn taloqî 24'ê Îlonê kir.

# Komîn -3-



Binevş SARYA

Di beşa 3'ê yem da jî emê hewil bidin kû li ser kornolojiya Dîrokî a komînan hinek din rawestin kû em bikaribin bi demêra berê xwe bidin roja meya îro kû bê ka jiyana komînal çiqasî maye an jî bê çiqas di wateya xweda tê jiyîn.

Piştî têkoşîna Hesen Sabah û şûnda, vê carê jî tevgera Karmatiyan ji boyî jiyana komîn tekoşîn dane meşandin. Mirov dema kû li şêwayê jiyana tevgera Karmatiyan dinêre mirov bi awayek hîn zelaltir rastî bermahiyên komîn û meclîsan tê.

Tevgera Karmatiyan kû di sala 870 de dest pêdike hetanîn salên 1070 yanî bi qasî 200 salî ramanê xwe li tavayî Rojihilata Navîn belavidikin. Di felsefa karimatiyan de xala herî zêde cî jêra tê dayîn perwerde û bi hevra jiyankirine. Karmatiyan navê xwe ji kesê kû tevger avakirî û pêşengitiya gurubê kirî navê xwe (Hamadan Eş El Karmat) buye û tevgerê navê xwe ji navê pêşengê xwe Karmat girtiye. Di nava tevgera karmatiyan da her kes bi peyva (Refiq) kû ev peyvî bi Erebiye di zaravayê Kûrmancî de tê wateya heval. Bi peyva Heval xîtabê hevdu kirine. Mirov dema kû ji vê peyvê derkeve rê wiha tê fêmkirin kû ciyê her kes bibe hevalê hev li wir cudahî û destihiladarî nabe. Ciyê kû peyva heval hebe bê guman li wê derê jiyana komîn û wek hev di asta jorîn de tê jiyîn.

Piştî têkoşîna tevgera Karmatiyan û şûn de jî mirov têkoşîna jiyana komînal di berxwedaniya Şêx Bedretîn da dibîne. Li gorî lêkûlînvanên Dîrokî wisan tê zanîn kû Şêx Bedretîn di sedsala 14. De li herêma Bakûrê Kûrdistan, li nêzî Edîrne qaleya Sîmavan hatiye Cîhanê.

Di felsefeya Şêx Bedretîn da jî jiyana komîn û komînal bûyîn di asta herî jorîn daye. Di gelek nivîsên derbarên şêx Bedretîn de tên gotin kû ji boyî cudahî nekeve navbera olan gelek tekoşîn daye meşandin. Di heman demê de ji boyî bikaribe gel ji rewşên kû diqewimin û her kes bikaribe bi pêş bikeve. Jiyana Derwîşan daye destipêkirin û Derwîş di nava gûndan de dane avakirin. Li gorî pêwîstiyên gel Derwîş geriyan mal mal gel perwerde kirine. Milk û ambarên genim bi awayek kû her kes bikaribe sûd jê wergire di nava gûndan de dane avakirin. Kesên kû destihladarî li ser gel kirine li dijî wana tekoşîn dane meşandin.

Dema kû mirov li diroka Rojihlata Navîn temaşe dike mirov bi awayek vekirî dibîne kû jiyan komînal tu caran paşgûh nehatiye kirin. Di hemu deman de hinek pêşeng derketine û bi yekibûyîna gelra ji boyî jiyanek komîn berxwedanî kirine. Li beranberî destihiladaran tû caran jiyana komînla bi bin neketiye. Di dîrokêda kesên kû ji boyî jiyanek ferd parêzî şerên gelan kiribin û dikin, bêguman dawiya wan binketine. Ji ber kû jiyan bi hevrabuyînê ra tê jiyîn. Her çendî kesên navdar weke Şêx Bedretîn bi destê dewleta Oamaniyan va hatibin bi darve kirin jî lê belê wan nekarîye şopên jiyana kom=komînal ji holê bidin rakirin. Kû heta roja îro jî, ji boyî jiyanek komînal li beranberî ferdiyetê tekoşîn û berxwedanî tê kirin. Piştî kû bajarbuyîn û ava bûyîn kentan li welatên Rojava li pêşketin li wiri jî tekoşîna ji boyî jiyana komînla bi pêşengitiya şoreşên gelan li pêş dikevin. Di rêze nivîsên em yên dinê da jî em dikarin tekoşîn û berxwedana jiboyî jiyanek komîn li welatên Rojava jî bi bînin.

# Divê li dijî êrîşan yekîtî ava bibe

***Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê PDK-S'ê Dr. Abdulkerîm Siko derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî başûrê Kurdistanê de axivî û diyar kir ku divê Hikumeta Iraqê li hember êrîşên li ser axa Iraqê helwestê nîşan bide û biryar bigire. Her wiha Siko da zanîn ku divê gelê kurd li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk bibe yek.***



Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê Abdulkerîm Siko diyar kir ku dewleta Iraqê derbarê êrîşên artêşa tirk ên li ser başûrê Kurdistanê de helwesteke cidî nîşan nedaye û wiha got: "Divê dewleta Iraqê di zûtirîn demê de biryara derketina Tirkiyê ji xaka Iraqê bide."

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê (PDK-S) Dr. Abdulkerîm Siko derbarê êrîşên dagirkeriya dewleta tirk a li dijî destkeftiyên gelê kurd, ev tişt anî ziman: "Erdogan dibêje ku li Amerîkayê jî kurd hebin, ez ê şerê wan bikim. Ev hezar sal e şerê gelê kurd dikin. Dewleta tirk a dagirker li dijî berxwedana gelê kurd tu serkeftin bi dest nexistine."

Siko di berdewama axaftina xwe de da zanîn ku Erdogan li Efrînê tu carî bi ser neket û got: "Bi dagirkerî û guhertina demografyayê dixwaze bi ser bikeve, lê bila berxwedana hate meşandin ji bîr neke. Gelê Efrînê 58 rojan li dijî tank û topan li ber xwe da û bersiv da wan. Dagirker çawa di êrîşên li Rojava de şikestin, dê di êrîşên xwe yên li ser Qendîl û herêmên din ên başûrê Kurdistan de jî bişikên."

Siko di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku divê helwesta li dijî êrîşên li ser Başûr diyar bin û wiha dewam kir: "Başûr parçeyek ji Kurdistanê ye. Erdogan di çarçoveya êrîşên xwe de bi gelek dewletên navneteweyî re hevpeymanan pêk tîne. Ev peyman li ser esasê tunekirina gelê kurd pêk tê. Dewletên navneteweyî jî li gorî berjewendiyên xwe çavên xwe ji êrîşên ku li dijî gelê kurd pêk tên re digirin. Hin kurdên bi Erdogan re di nava îtîfaqan de ne û li gorî wî tev digerin, ji kurdewariyê dûr in."

Abdulkerîm Siko di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser helwesta dewleta Iraqê ku heta niha helwestek berbiçav nîşan nedaye û ev tişt anî ziman: "Hikumeta Iraqê derbarê êrîşên dewleta tirk ên li ser axa başûrê Kurdistanê de tu helwesteke berbiçav nîşan nedaye. Dewleta Iraqê daxuyanî li dijî êrîşên Erdogan dan, lê tu bandora wan daxuyaniyan nîn e. Di çarçoveya daxuyaniyan de tu gavên cidî nehatine avêtin. Heya niha tu biryarên bibandor di parlamentoya Iraqê de nehatine dayîn. Dewleta tirk bi leşkerên xwe ji sînor derbas dibe, lewma divê hikumeta Iraqê parastina sînorê xwe bike. Nehêlin dewleta tirk a dagirker êrîşên xwe li ser axa başûrê Kurdistanê pêk bîne. Divê hikumeta Iraqê di zûtirîn demê de biryarê bide ku artêşa tirk a dagirker ji xaka Başûr vekişe."

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê Abdulkerîm Siko di dawiya axaftina xwe de gotina "Ger em nebin yek em ê biçin yek bi yek" bi bîr xist û ev tişt anî ziman: "Lewma pêwîst e gelê kurd yekitiya xwe saz bike û li dijî dagirkeriya tirk hêza xwe bike yek."… ***ANHA***

## PKK nebûya wê Başûr ji dest biçûya

Siyasetmedarê Kurd Dr. Fayiq Gulpî ya li ser daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî a li dijî PKK'ê gotubû, 'PKK beşeke xaka Herêma Kurdistanê dagirkiriye' da û got,"Eger ne ji PKK'ê bûya wê Kerkûk, Şengal, Behdînan, Mexmûr tev ji dest çûba. PKK partiyeke Kurdistaniye û ji zarokên çar parçeyên Kurdistanê pêk tê. Divê Barzanî lêborînê ji gelê Kurd û PKK'ê bixwaze."



Piştî ku Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di daxuyaniyeke çapemeniyê de bêyku qet behsa dagirkerî û êrîşên dewleta Tirk yên li Başûrê Kurdistanê bike, PKK'ê bi dagirkirina Başûrê Kurdistanê tawanbar kir şûn ve nerazîbûn zêde bûn. Hem siyasetmedarên Kurd hem jî gelê Kurd li dijî derdikevin û dibêjin, eger ne ji PKK'ê bûya wê Başûrê Kurdistanê ji aliyê DAIŞ'ê ve hatiba dagirkirin.

Gulpî der barê axaftina Barzanî de ku dibêje, 'PKK beşek ji Herêma Kurdistanê dagirkiriye' wiha got, "Ne mentiqiye ku hêzek Kurdistanî li Kurdistanê dagirker be. PKK partiyeke Kurdistaniye û zarokên ji 4 parçeyên Kurdistanê di navê de cih digirin."

### PKK'Ê BAŞÛR PARAST

Gulpî dema êrîşên DAIŞ'ê yên li ser herêmên Başûrê Kurdistanê jî bi bîr xist û wiha dewam, kir, "PKK ji bo çar parçeyên Kurdistanê dixebite. Eger ne ji PKK'ê bûya wê çeteyên DAIŞ'ê Hewlêr, Şengal, Mexmûr û heta Behdînanê jî ji destê Herêma Kurdistanê girtiba û dagirkiriban. Di dema şerê DAIŞ'ê de PKK sînorê Herêma Kurdistanê parast, di eniya herî pêş de cih girt û şehîd da. Hatina wan li ser daxwaza PDK û YNK'ê bû. Lê ya rastî eger ev hêz nexwestiba jî wê PKK bajar û bajarokên Herêma Kurdistanê biparasta."

### DIVÊ BARZANÎ LÊBORÎNÊ BIXWAZE

Siyasetmedarê Başûrê Kurdistanê Fayiq Gulpî daxwaza lêborînê ji Nêçîrvan Barzanî kir û axaftina xwe wiha bi dawî kir, "Ti fêdeyeke daxuyaniyên wiha yên Nêçîrvan Barzanî ji bo wî, PKK'ê û gelê Kurd nîne. Ev tenê dijminên gelê Kurd kêfxweş dike. Ev daxuyaniyên Barzanî dilê gelê Kurd êşand. Ji ber vê divê Barzanî lêborînê ji gelê Kurd û PKK'ê bixwaze."

## HDP wê têkoşîna xwe mezintir bike

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku li gel encamên bi guman ên hilbijartinê jî gel xwedî li HDP'ê derket. Temellî got, Erdogan wê hîn bêhtir zordariyê bike û ew ê jî têkoşîna xwe geş bikin.



Hevserokên Rêxistinên HDP'ê yên bajaran piştî hilbijartinên 24'ê Hezîranê yekem car civiyan. Civîn bi beşdariya Hevserokên Giştî Pervîn Bûldan û Sezaî Temellî pêk hat.

Temellî di destpêka civînê de got, "Ji ber ked û hewldanên we, spasiya we dikim. Spasiya herî mezin jî ji gelê Kurd ê berxwedêr dikim. Gelê Kurd hem helwesta xwe ji bo demokasiyê nîşan da, hem jî gelên Tirkiyê got 'bêyî HDP'ê nabe' û bend careke din hilweşand."

Temellî bi bîr xist ku hilbijartin di nava Rewşa Awarte de hatiye kirin û tevî ku li Pirsûsê HDP'yî hatin kuştin jî kesek nehatin destgîrkirin.

Temellî da xuyakirin ku encamên hilbijartinê bi guman in û got, "Encamên hilbijartinê yên bi bandora garnîzonê li Colemêrg û Şirnexê derkete holê, nîşan dan ku encam çiqasî bi guman in."

Temellî destnîşan kir ku wê bersivê bidin gotina "Bêyî HDP'ê nabe" û got, "Li gel zîhniyeta Rewşa Awarte û zîhniyeta zordar, em ê bi têkoşîna xwe ya demokrasiyê bi biryardarî bidomînin."

Temellî diyar kir ku rejîma Erdogan bi bikaranîna xizaniyê li ser desthilatdariyê dimîne û ji niha û pê ve wê hîn bêhtir zordariyê bike. Temellî got, "Ji ber vê yekê HDP wê têkoşîna xwe ya li parlamentê ya li dijî vê rejîma zordar geş bike."

Temellî bal kişand ser şîdet, kuştin, destavêtin û destdirêjiya li zarokan û got, "Tenê bi cezakirina sûcdar re nepêkan e ku ev krîza civakî bê çareserkirin. Nêzîkatiya siyasî ya desthilatdariya heyî, çavkaniya vî sûcî ye."

Li ser nîqaşên derbarê îdamê jî Temellî destnîşan kir ku ew li dijî îdamê ne û got, "Li welatên ku cezayê îdamê lê heye, sûc kêm nabin. Bi salan e em balê dikişînin ser destavêtin û destdirêjiya li zarokan. Em dixwazin Wezareta Zarokan ava bibe. Lê belê di vî warî de li dijî sûcên li hemberîz arokan tiştek nayê kirin. Çi dikin, radibin îdamê dixin rojevê."

Di dewama axaftina xwe de Temellî anî ziman ku sîstema nû ne dermanê pirsgirêkên li Tirkiyeyê ye û got, "Temsîliyeta me di asta mûxalefeta bingehîn de ye. Ji bo ev sîstem veguhere sîstemeke parlamenter a demokratîk em ê têkoşîna xwe bidomînin."

## Daxuyaniya Barzanî xizmetê ji dagirkeriya Tirk re dike



Parlamenterê Tevgera Goran Şêrko Heme Emîn daxuyaniya serokwezîrê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî rexne kir û wiha got: "Diviyabû daxuyaniya Barzanî li dijî dagirkeriya Tirkiyê hatiba kirin. Qendîl di dîrokê de bûye sembola têkoşînê, me dît çawa PKK'ê bi pêşmergeyan re axa başûrê Kurdistanê li dijî DAIŞ'ê parast."

Dewleta tirk a dagirker di mehên dawîn de êrîşên xwe yên dagirkeriyê li ser axa başûrê Kurdistanê zêde kirin. Tevî dewleta tirk a dagirker nêzî 30-40 km axa başûrê Kurdistanê dagir kir û bi dehan sivîl qetil kirin jî, serokwezîrê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di daxuyaniya 4'ê mehê de PKK wek "hêzek dagirker" bi nav kir.

Parlamenterê Goranê Şêrko Heme Emîn daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî rexne kir û diyar kir ku divê ji bîr nekin ku PKK'ê bi pêşmergeyan re axa başûrê Kurdistanê parast.

Emîn bal kişand ser dagirkeriya dewleta tirk a li ser axa başûrê Kurdistanê û anî ziman ku dewleta tirk bi awayekî vekirî êrîşî hemû statuyên kurdan dike û destnîşan kir ku dewleta tirk destpêkê êrîşî Efrînê kir, niha jî axa başûrê Kurdistanê dagir dike û got: "Erka hikumeta başûrê Kurdistanê û dewleta Iraqê ew e ku li dijî dagirkeriya dewleta tirk helwestên zelal nîşan bidin, rewşa wan a heyî cihê şermê ye."

Emîn daxuyaniya Barzanî rexne kir û da zanîn ku diviyabû daxuyaniyên wî li dijî dagirkeriya dewleta tirk bana û bi bîr xist ku di dîrokê de tu dewletan nekariye Qendîlê dagir bike û wiha pê de çû: "Qendîl her tim di dîrokê de bûye sembola têkoşînê û bûye bingehê şoreşa Rojhilat, Bakur û bi taybet jî şoreşa Başûr. PKK hêzeke Kurdistanê ye, Kurdistan jî axa wan e."

Emîn her wiha berxwedana 2014'an a gerîlayên PKK'ê ku li dijî dagirkeriya DAIŞ'ê ya li ser başûrê Kurdistan pêk hat, bi bîr xist û wiha berdewam kir: "Me dît ku PKK'ê bi gelê Başûr û pêşmergeyan re li dijî DAIŞ'ê axa başûrê Kurdistanê parast û bi hev re mil bi mil li ber xwe dan. Divê niha jî wek rihê yekgirtinê li dijî dagirkeriyê bibin yek û li ber xwe bidin. Nabe em çavê xwe ji dagirkeriya Tirkiyê re bigirin. Divê hemû partî, saziyên sivîl û gelê başûrê Kurdistanê li dijî van êrîşên dagirkeriyê helwestên zelal nîşan bidin."

Emîn da zanîn ku ku dagirkeriya Tirkiyê ya başûrê Kurdistanê dibe sedemê şehadeta sivîlan û wiha pê de çû: "Divê hikumeta başûrê Kurdistanê û hikumeta navendî ya Iraqê li dijî van êrîşan lêpirsînê dest pê bike û helwestê nîşan bide."

Parlamenterê Goran Şêrko Heme Emîn di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku daxuyaniya Barzanî rasterast di xizmeta dagirkeriya dewleta tirk de pêk hatiye û got: "Dê ev daxuyanî bandoreke neyînî li yekitiya kurdan a her çar parçeyên Kurdistanê bike."…***ANHA***



# Rapora Efrînê hat eşkere kirin

***Komîteya Dîplomasî, Têkiliyên Karê Derve ya Şehba û Rêveberiya Kantona Efrînê, têkildarî pirsgirêkên gel ên li Şehba û Şêrewa raporek amade kir. Di raporê de hate destnîşankirin ku ji ber bêderfetiyên tenduristiyê û mercên giran di nava gelên li gundan û kampên li herêma Şehbayê bicihbûne de nexweşiyên cihê rû didin.***

Di rapora têkildarî Efrîniyên li Şehbayê hate amadekirin de, hate destnîşankirin ku ji ber bêderfetiyên tenduristiyê û mercên giran di nava gelên li gundan û kampên li herêma Şehbayê bicihbûne de nexweşiyên cihê peyda dibin.

Komîteya Dîplomasî, Têkiliyên Karê Derve ya Şehba û Rêveberiya Kantona Efrînê, têkildarî pirsgirêkên gel ên li Şehba û Şêrewa ji roja 20'ê Çileya 2018'an ve êrîşên dagirkerî û qirker a dewleta Tirk a li ser Efrînê raporek amade kir. Di raporê de pirsgirêk û aloziyên gelên li Şêrewa, Şehba û gundan, dîsa gelên li kampan bi cih bûne hatin destgirtin.

Di rapora hemû dane û raporên saziyên ku ji bo Efrînê kar kirî cih girtin de, bal tê kişandin ser pirsgirêkên mîna aborî, tenduristî, perwerdehî û gelek pirsgirêkên din ên civakî.

Di rapora tê de hate bibîrxistin ku di êrîşên dewleta Tirk a dagirker de bi hefteyan êrîşî bajar û gundên Efrînê hate kirin û wiha hate gotin: "Bi hezaran mirovên ji gund û navçeyên Efrînê koç kirin, li navenda Efrînê kom bûn. Her ku êrîş û bombebarana dewleta Tirk û çeteyên wê dewam kirin, bi sed hezaran welatî berê xwe dan navenda Efrînê. Ji ber êrîşên topan ên li ser taxan û êrîşên hewayî mirov di mala xwe de birîndar bûn, gelek jî jiyana xwe ji dest dan, her wiha gelek sivîl jî ji aliyê sekvanan ve hatin qetilkirin. Li gorî daneyê wê demê yên Nexweşxaneya Avrînê li gorî dîroka 13'ê Adara 2018'an 238 sivîl jiyana xwe jidest dabûn, 706 sivîl jî birîndar bûbûn. Gelê sivîl ê 58 rojan êrîşên dewleta Tirk û êrîşên hewayî li ser hatin kirin, ji herêmê derketin, dîsa êrîşên hewan û topan li ser hatin kirin. Bi taybet nexweşxane, çavkaniyên avê û firin bû hedefa êrîşan. Nexweşxaneya Avrîn 16'ê Adara 2018'an ji aliyê dewleta Tirk ve hate bombekirin û bi temamî hate rûxandin. Ji bo ku gelê Efrînê neyê qirkirin neçar ma ku berê xwe bide Şehbayê. Di dema koçkirinê de ji ber ku gelek welatiyan wesayît nebûn neçar man ku zarokên xwe li ser mil û pişta xwe tevî sir û sermayê bi rê bimeşin. Gelek welatiyên bi temen ji ber kirîza dil di rê de mirin.




Di raporê de hate bibîrxistin ku bi hevkariya rêveberiya Efrîn û Şehbayê karîn pêwîstiyên gel bên bicihanîn û tîmên tenduristiyê yên ji aliiyê Heyva Sor a Kurdistanê ve hatibûn amadekirin, 24 saetan rewşa gel a tenduristiyê dinêrin.

Her wiha di raporê de hate destnîşankirin ku li Şehba 3 kampên Serdem, Berxwedan û Efrîn hatine avakirin û ev tişt hate gotin: "Ji ber neçêkirina sîstema binesazî, ji ber rewşa ava qirêj li kampê nexweşiyên gurçik ên welatiyên li kampan dijin derketine pêş. Dîsa yek ji pirsgirêka din kêmbûna derman heye.

Nexweşên giran tên rêkirin Hatay û Helebê, ji ber dorpêçê rê jî bi xeter in. Qirêjiya hewa û avê pir zêde ye. Ji bo xwe parastina ji dupişk û maran bi qasî tê xwestin tevdîrên pêwîst nîne."

Di raporê de hate gotin ku ji ber bêderfetî û mercên giran ên li gundên herêma Şehba û Şêrewa dîsa Kampên Serdem, Berxwedan û Efrîn ên li Herêma Şehbayê hatine bicihkirin, gelek nexweşî derketine pêş.

Di raporê de bal hate kişandina ser nexweşiyên mîna penceşêr, werem, Hepatît b, sorik, bêxewî, her wiha jin û zarok jî bi nexweşiyên belavker re rû bi rû ne.

Rêxistina Navneteweyî û UNICEF ji bo zarokên ji cih û werên xwe yên Efrînê koçber bûn, heta niha tiştek nekiriye û ev jî bûye sedem ku nexweşiyên belavker û giran hê zêdetir bibin û belav bibin."

## Teqîna li Minbicê nîşaneya têkçûna wan e

MSD'ê êrîşa li Minbicê şermezar kir û got ku êrîşa li dijî sivîlan têkçûna dewleta tirk û hevkarên .wê nîşan dide

Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê têkildarî êrîşa li dijî meşa ku li navçeya El-Heya ya Minbicê pêk hat daxuyaniyek da û destnîşan kir ku êrîş têkçûna .êrîşkaran nîşan dide

Daxuyaniya MSD'ê ku li ser malpera wê ya fermî hate weşandin, :wiha ye

Aramî û ewlekariya li bajarên" Bakurê Sûriyê di salên derbasbûyî de pêk hat, rastiya nimûneya jiyana hevbeş a di navbera hemû pêkhateyan de nîşan dide. Şêniyên herêmê bi zanebûna xwe karîbûn çarenûsa xwe ya hevbeş ferz bikin û aramiya ku li tu herêmên Sûriyeyê wekî wê nîn e, pêk bînin. Tiştekî xwezayî ye ku şêniyên Minbicê sekneke birûmet li dijî destwerdana dewleta tirk û çekdarên tundraw di kar û barên .hundir de derkevin

Di 5'ê Tîrmeha 2018'an de şêniyên Minbicê li navçeya El-Heye li dijî destwerdana tirk û dagirkeriya Efrînê meşek li dar xist. Meşvan bi teqîneke terorîstane hatin hedefgirtin. Di encamê de sivîlekî jiyana xwe ji dest da û 22 sivîl birîndar bûn. Ev tenê ji ber ku helwesta xwe li dijî siyasetên dewleta tirk ku aramiya herêmê binpê dikin, anîn ziman hate kirin. Armanc ji meşê derxistina rastiya dagirkeran û aşkerakirina siyasetên wan ên xerabkariyê li .bajarên Bakurê Sûriyê ye

Ev êrîşên ku sivîlan hedef digirin, îflasa çeteyan û aliyên piştgiriya siyasî û leşkerî dide wan nîşan didin. Armanca êrîşkaran ew e ku tevliheviyê di nava sivîlan de belav bikin û terora xwe li ser wan ferz bikin. Wiha jî dengê gel ên kiryarên dewleta tirk qebûl nakin, .rawestînin

Ev êrîşa terorîstane, cihê şermezariyê ye û karîseyek li dijî tevahî mirovahiyê ye. Lê dê israr û berxwedana gelê me ya li dijî dagirkeran zêde bibe. Gelê me ji bo parastina bajarê xwe bi israr e û dê li dijî hemû cureyên destwerdanan derkevin. Ev êrîşa hate kirin jî heger nîşaneya tiştekî bike, lawaziya êrîşkaran û yên piştgiriya wan dike, nîşan dide. Hemû hewldanên wan ên li dijî şêniyên ".bajarê Minbicê têk çûn

## Li Minbicê meclîsa gelan heye

Ji berpirsiyarê Hêza Xweparastina Minbicê Qasim Remo, li dijî îdîayên ku Tirkiye dê li Minbicê meclisa sivîl ava bike got: "Li Minbicê ji xwe Meclîsa ji rêveberiya ku Ereb, Kurd, Ermenî, Tirkmen, Çeçen û Çerkes di navde hene heye." Remo, destnîşan kir ku meclîsa hatiye avakirin ji bo .çareseriya krîza Sûriyê model e

Tirkiye demek dirêj e mudaxaleya li dijî Minbicê xistiye rojeva xwe. Piştî Tirkiye û DYA li hev kirin, di çarçoveya lihevkirinê de Tirkiye li ser sînor dewriye digere û piştî hilbijartina 24'ê Hezîranê dîsa gefên .xwe berdewam dike

Li gel ku 60 roj berê Hêzên YPG'e ji herêmê derketin jî meclîsa gelan hat avakirin, ewlehî di destê meclîsa leşkerî ya Minbicê de ye jî hat diyar kirin ku Ewlehiya Minbicê wê bi destê DYA û artêşa Tirk bê parastin. Gotinên rayedarên Tirk yên Meclîsa leşkerî û sivîl ava .kiriye jî rastiyê nişan nade

Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di sala 2016'an de li dijî hêzên DAÎŞ'ê hat avakirin. Piştî meclîsa leşkerî hat avakirin Bajar piştî şerê li Sûriyê bêhn stand û aramî pêş ket. Piştî Minbic hat rizgarkirin bajar ji nûve hat avakirin û meclîsa sivîl ku vîna hemû gelan diparêze hat avakirin. Meclisa Sivîl a Minbicê reng û ruyê mozaik a gelê bajar di nava xwe de vehewand. Di rêveberiya meclîsa bajar de Ereb, Kurt, Turkmen, Ermeni, Çeçen û Çerkez .hene

Minbic, ji bo Sûriye xwedî rewşek stratejîk e. Hem li ser Çemê Firatê ye, hem jî wekî rêbork e. Bajarê ku demekê ket destê OSO û DAÎŞ'ê niha ji aliyê gelên Minbincê ve tê parastin. Piştî meclîs ket destê gelan Tirkiye her dem Minbic kir hedefa xwe. Tirkiye YPG'ê dike .hincet û her dem dixwaze êrîş bike

### KONTROL DI DESTÊ MECLÎSA LEŞKERÎ DE YE

Berpirsiyarê Erka xweparastinê yê Meclîsa Leşkerîya Minbicê Qasım Remo, diyar kir ku meclîsa leşkerî ya minbicê bi xwe parastina xwe dike û wiha got: "Gelên Minbicê bi xwe parastina xwe dike. Gelên Minbicê meclîsa leşkerî ava kirine û bi meclîsa leşkerî parastinê dikin. Hêzên koalîsyonê jî li gelek noqteyên bajar sekinîne. Gotinên ku YPG li Minbicê ye ne rast e. Meclisa leşkerî û sivîl ku ji pêkhatiyên gelan hatine avakirin ji bo çareseriya pirsgirêkên li Sûriyê mînak û model e. Meclisa me ji hemû pêkhateyên gelên Minbincê pêk tê. Di meclîsa leşkerî ya Minbicê de Ereb, Kurd, Ermenî, Tirkmen, Çeçen û Çerkes heye. Meclîsa hatiye avakirin ji bo çare- .seriya krîza Sûriyê model e Tirkiye armanc dike ku di bin navê meclîsê de Mertalên Firatê li vir bi cih bike. Dixwaze komên çeteyan li vir bi cih bike. Ev kesên teslîmî DAIŞ'ê bune. Komên ku Tirkiye piştgirî dide bi destê MÎT'ê hatiye avakirin. Bi vî rengî dixwaze di nava gelan de bê baweriyê ava bike."…***Nazim Daştan/Minbic***






# Hemû rêyên Erdogan ber bi çiravê ne

Idrîs HENAN

Xuya bû wê piştî dagirkirina Efrînê Sûriyê û herêm di aliyê hevsengiya hêzê û pêşketinên siyasî de derbasî qonaxeke nû bibe. wê têde rola hinek hêzên mudexeleker ên mîna Îran û Tirkiyê ber bi aliyekî nû ve biçe. Ango wê bandor û asta mudexeleya van hêzan nava karên hundirîn ên welatên dîtir de bête bêtesîrkirin û dibe heya radeyekê jî kirîza heft-heşt salî ya li herêmê derbasî nava van welatan bibe. Itîfaqên nepenî yên Amerîka û Rûsyayê jî vê pêşbîniyê piştrast dikin.

Hemû şopdarên pêvajoya aloziya Sûriyê dikarin bi hêsanî eserên van itîfaqan li ser sînordarkirina asta mudexeleya van hêzên herêmî bibînin. Beriya sê salan dema ku Amerîka û Rûsya li ser hinek deverên Sûriyeyê li hev kiribûn, taybet başûrê Sûriyê, wê çaxê hêzên nola Tirkiyê û Îran li derve mabûn. Ev jî bibû sedema aciziya wan hêzan. Îro jî ev hêzên hegemon, taybet piştî kirîn û firotina axa Sûriyê, li defterên xwe yên berê vedigerin û hesabên xwe li gorî encamên sindokê dikin. Nîşaneyên aloziyê diyar dikin ku êdî ev hêzên han wê rê li ber çilekiyên Îran û Tirkiyê li herêmê bigirin. Wê ev herdu jî bên çerxeriya hilbijartina mewziyê. Bi taybet dewleta Tirkiyê bi serperştiya sîstema nû ya ku modela faşîst li ser civaka xwe di 24 Hezîranê de ferz kiriye, hatiye kêliyeke wer hestiyar ku êdî lazime bloka xwe net bike. Rûpîvana ku ev çend salin têde navbera Rûsya û Amerîka de digeriya, êdî teng bûye. Gereke bi lez û bez mewziya xwe belî bike.

Niha ger em li şansên Tirkiyê û sîstema homojen, netew-olperest- a ku Erdogan avakiriye binêrin, em ê bibînin ku bi vê biçimê hatiye afirandin, ne li hundir û ne jî li derve ti şansê wê nemaye. Herdu bijêrekên wê jî tal in. Ger ber bi Amerîkaya ku di hilbijartinan de destek dayê re biçe, wê rastî dijminahiya Rûsyaya ku rê dayê beşek ji axa Sûriyê dagir bike were. Ger xwe bi aliyê Rûsyayê ve jî bade, wê rûbirûyî hevlabendên xwe Amerîka û NATO bimîne. Bê goman ev rewşa ku Tirkiyê ketiyê, ne badilhewa ye. Ew jî ber bi kozikê ve hatiye ajotin. Daxuyaniyên rayedarên Amerîkî piştî hilbijartinên 24 Hezîranê ku pêwîste Tirkiyê navbera F35 û S400 hilbijêre, baş nîşan didin bê Erdogan û ekîpa wî li hemberî çi bijardeyê ne.

Di cebheya hundirîn de rewşa Erdogan ji ya derver ne baştir e. Encamên hilbijartinan ne li gorî plansazî û dilê Erdogan û itîfaqa MHP û AKP bûn. Rêjeya ku her kes dizane bi hîleyan bi dest xistiye, asta wendahiya li hemberî cebheya hundirîn diyar kiriye. Her wekî din, serketina cebheya demokratîk bi pêşengiya HDP careke din isbat kiriye ku Erdogan û hikumeta wî kirîzeke siyasî ya kûr dijîn. Ev kirîz tekez bi xwe re zemîna rûdana darbeyekê yan qeyraneke ji ya Sûriyê kûrtir ava dike.

Êrşên Rûs-Rejîmê bi ser Deraa, bicihbûna hêzên Rûsya li Efrînê û êrîşên çeteyên Tirkiyê ser Tadifê de, diyar dikin bê Tirkiyê bêçariyeke çawa dijî. Bê goman şîreta senatorê Amerîkî Lênzî Graham ku ji Erdogan re gotiye; mudaxeleya nava Sûriyê wê te bixe çiravê, baş diyar dike ku êdî dema otorîteya Erdogan xeyal dikir qediyaye û wê di nav bijardeya F35 û S400 de bergalê ji dest bide. Ango hemû riyên wî digihin çiravê.